# Newroz



Dr Nûredîn Zaza
1919- 1988



Osman Sebrî
1905 - 1993

*Xebat ji bo* : * Zordarî ji ser gelê me yê Kurd li Sûriyê rabe .
* Azadiya demokrat û rêzgirtina mafên mirovan .
* Mafên gelê Kurd yên netewî di çarçewa yekîtiya welêt de .

*Ji weşanên Partiya Yekîtî ya Demokrat a Kurd li Sûriyê* - YEKÎTÎ

**Hejmar (102 ) sal 18 Nîsan 2012 z - 2624 k Buha ( 15 )ps P.S**


## İsmaîl BEŞİKÇÎ

*Li ser rewşa guhertinên ku li devera Rojhilata Navîn û Sûriyê destpê kirine, kovara BÎR a bi zimanê Kurdî û Tirkî tê weşandin,tê de çend pirs ji zanyar û civaknas ê Tirk ê navdar Pro.Dr.Ismaîl Beşikçî kirine û li dawiya meha Avdarê di malpera xwe de belavkiriye. Li jêr, em hin bersivên wî derbarê pirsa Kurdî û ya Sûrî pêşkêşî xwendevanên NEWROZ ê dikin: (NEWROZ).*

***Kovara BÎR:*** Di rewşa îroyîn a Rojhelatanavîn de, Rusya, Çîn, Îran, Sûryê û girûp û rêxistinên bi wan ve girêdayî, armanc û îdeolojiya wan çi dibe bila bibe, bûne parastvanên rejîmên dîktator û statuqûyê. Gelo… ev xeta statukûparêz a berhemê dema Şerê Sar, dikare çi tesîr li ser guhartinên di Rojhelata Navîn de bike?.



B: Rûsiya, Çîn, Îran, Hizbulah, li Sûriyê xebatên li dij guherînan dikin. Helwesteke wan a bi biryar heye. Lê, hêzên Rojavayî yên ku piştevaniya guherînê dikin û opozisyona Sûriyê ne, xwedî raman û projeyên diyar in. Wek mînak li hember Birayên Misulman yên ku piştevaniya guherînê dikin û di nava opozîsyonê de cihekî girîng digrin, helwesteke wan a diyar nîne. Bi tevî hemû kêmasiyan jî ez bawer im, ku hêzên statuparêz dê nikaribin guherînê bidin rawestandin. Di vê karnavê de, hewldanên **D.R.( 12**


Cejin û şahiyan ji welatê me bar kirine
Rêberê Silîvî 3

Bawer Mekin Ew Mir?
Fnehîte Morad 5

Banga Pişgiriyê 6

Parastina Zaravên Kurdî
Riza Çolpan 8



Email : Newroz 95 @ hotmail . com

Nûçe û Çalakî Nûçe û Çalakî

# Çilrojiya Nemir Dr. Şêrzad Hac Reşîd

Di bîranîna hevalê nemir Şêrzad û çelrojiya wî de ,li ser vexwendina rêxistina Helebê ya Partiya Yekîtî ya Demoqrat a Kurd li Sûriyê ,bêtirî dûsed ciwanên Kurd ji keç û lawan li deriyê bajaroka Reco li hev civîn, kat 9 ê sibê û bi cilên sipî yên bi wêneya pakrewan Şêrzad xemilandî , karwana meşê bi sirûda netewî ya Kurd (Ey Reqîb) dest pê kir.Bi hildana alên rengîn,ala Kurdistanê û yên partiya D.r Şêrzad ,bi hestekî bilind û bankirina siloganên wek: bijî yekîtiya gelê Kurd,. Namire heval şêrzad namire, kî ne em...Kurd in em, û kî ne em...yekîtî ne em jî, bi rê ve çû. Li ser deng û banga kerwana hevalê Şêrzad, bi sedan kes ji miletê Reco hatin pêşwaziyê, li her aliyên kolanan rawestîn, rêzgirtin ji wê meşê û pakrewan re girtin



Û xortên payebilind, meşa xwe di nav gelî û çiyayên bi şana aştiyê (darên zeytûnan),xemlandî berdewam kirin.Ew dar û berên sêwî -yên ku her dem li benda D.r Şêrzad bûn û bi dîtina wî şîn û geş dibûn- vê carê bi çemelên xwar û pelên çelmisî ,karwana Şêrzad pêşwaz kirin.Meşa ciwanan li gel karwana otombêlan, bi awakî şaristanî û heyamek xemginî berdewam kir,ta li kat 1 ê nîvro gihan gundê Elemdara,gundê heval şêrzad. Li pêşiya gund ,bi hezaran kes ji gundî û mêvanan , pêşwaziya karwanê derketin. piştî ku dost û hevalên şehîd ,bi ditina gorna wî re,çavên xwe bi hêstiran kildan ,rêwîresma çelrojiya hevalê nemir D.r Şêrzad dest pê kir:

1)pêşwazî û sipasiya milet bi navê Partiya yekîtî (pêşkêşvanê rêwîresmê ) .

2)Rawestina kêlîlkek bêdeng ji bo giyanên pakrewanên azadiyê û şoreşa Sûriyê û pakrewanên Kurd û Kurdistanê ,bi taybet ji bo giyanê heval Şêrzad.

3) Ey Reqîb.

4)Gotina Rêxistina Xwendekaran a Partiya Yekîtî ya Demoqrat a Kurd li sûriyê.

5)Gotina dostên D.r Şêrzad.

6)Gotina Encûmana Niştimanî ya Kurd - D.r Ebdil mecît Şêxo.

7)Gotina Encûmana gel a Rojavayê Kurdistanê- Bavê Dilo.

8) Gotina Partiya Yekîtî ya Demoqrat a Kurd li Sûriyê- sekretêrê Partiyê Mihyedîn Şêx alî.

9)Gotina malbata Şehîd Şêrzad-Apê Şehîd.

10)Gotina bavê Şêrzad endezyar Selah Elemdarî.

.11)Li dawiyê kulîlkek ji kulîlkên çiyayê Kurmênc hestên xwe pêşkêş kir, bi gotina :Encûmana Niştimanî ya Kurd nûnera min e.û pişt re bi Sirûda Ey Reqîb wê kulîlkê gotina xwe bi dawî kir.

Li dawiyê pêşkêşvan bi navê Partiya Yekîtî,sipasiya milet kir ,û bi mûzîka xemgîn xatir ji malbata Şêrzad hate xwestin.

## PÎROZ BE

1-Bi hatina cejna Çarşerma Sor, cejna birayên me yên Êzdî, bi navê komîta birêvebir ya Newrozê, em li xwe û wan pîroz dikin.

2- Bi navê komîta birêvebir a Newrozê,em damezrandina komela Rewşen Berdir-xan li bajarê Efrînê, li xwe û wan pîroz dikin û hêviya serkeftinê jê re dikin.

# Cejin û Şahiyan
# Ji welatê me bar kirine

Rêberê Silîvî

Hemû rewşenbîr, nivîskar, hezker û berketiyên zimanê Kurdî dizanin ku roja 21ê Sibatê ji her salê, roja cîhanî a zimanê dayikê ye. Roja hezkirin û aştiyê ye, roja piştevanî û hevgirtina gelan e. Di vê roja pîroz de, çalakvan û mirovhezên cîhanê zend û bendên xwe vedimalin û ji bo parastina ziman, çand û zargotina gel û kêmnetewan mil li mil, xebateke hevbeş dikin.

Lê mixabin ku îsal ev roja bi nîşan bi ser gelê Sûriyê de hatiye, ew di rewşeke awarte û pir aloz de dijî, rewşeke wihaye ku hawîr, şînê konê xwe vegirtiye û welat ser û ber reş girêdaye û xwîn digirî!!... Eve nêzîkî salekê ye, gelê Sûriyê bi hemû pêkhateyên xwe, bi rê, awa û şêweyên aştiyane daxwaza mafên xwe yên rewa di jiyaneke azad û bi rûmet de dike, da ku ew bi destên xwe, çarenûs û pêşeroja xwe destnîşan bike û bibe xwediyê mal, mewdan û semyana welatê xwe, bend û zincîrên koletî û bindestiyê bişikîne!!.

Ji wê rojê vir de, karbidestên dewletê har û dîn bûne, çav di serê wan de sor bûne, rişma tund û tûjiyê berdane, kîn û mirina reş bi ser gel de rijandine, gund û bajar topbaran û kavil kirine, mêr û jin, zar û zêç, pîr û kal bi kêr û singoyan gurandine,û kuştin û kiryarên hovane yên dûrî sinciyên mirovatiyê bi wan re bi kar anîne!!..

Di rewşeke wiha xembar û dilêş de, zimanê Kurdî di roja cejna xwe ya cîhanî de reş girêdaye û ji van kiryar û dîdarên xwîndar, lal û matmayî maye!!..

Sed mixabin ku vê demê, cejin û şahiyan ji welatê me bar kirine, kevokên aştiyê ji tirsa mirinê firiyane dûr çûne, lê, bê gûmane ku piştî tengahiyan ferehî ne û dê asîmanê welatê me sayî bibe, bayê azadî û serfiraziyê dê vê mij û moranê bide ber xwe û dûr bibe. Wê hingê, dê tîrêjên rojê bighine her bosteke axa welêt.

Zimanê Kurdî, bi dilekî tev derd û xem dibêje:"Bila roja cîhanê a zimanê dayikê li xwişkên min zimanê Erebî, Siryanî, Ermenî, Tirkî, farisî û hemû zimanên cîhanê pîroz be!.".

*********************************

**Dumahîk: Di 114 saliya…**

li wîr berhemên xwe çap bikin, hem ji ber qedexbûna ziman û hem ji ber buhayê çapkirinê...

Dawî dibînim ku, weşangeriya me bi qedexebûna zimanê me ve girêdayî ye, pêşketina ziman û weşangeriya Kurdî li BinxetêBi qedexebûna ziman ve girêdayî ye, çendî qedexebûna ku li ser zimanê me heye rabe, wiha wê weşangeriya me bi pêş keve û çendî weşanxaneya me bi pêşkeve wiha jî wê zimanê me bi pêşkeve.. Di baweriya min de roja dawiya van asteng û arîşeyên ku di pêş weşangeriya kurdî de li Binxetê heye nêzîk dibe, em li hêviya wê rojê ne, ew roj nêzîke, ne dûr e.

## Dumahîk; Bawer mekin..

, Ebilhemîd Zîbarî û H.W.D, ku bi hezaran yadê bi destên setemkaran û neyarên azadî hatine kuştin, delala min yadê, bawer bike ku tenê em bi laşê xwe mirîne lê, bi giyanê xwe herdem li rex we ne û bi keser gotinên xwe berdewam dikir û digot : Yadê temî û şîreta min ew e ku , zor girînge Kurd hevdu bipejirînin û ji ya xwe nemînin , rojên li pêş yên me ne yên azadiyê ne ! Yadê ma kî nizane, ku azadî çiqas xweş e ! Hîngê min dikir ,ku kît bi destên wî bigirm û bi dengekî bilind hawar û banga xwe li tevan bikim, ku vaye Şêrzad nemiriye û namire .Ew li rex me ye, hîn ez di wa destnavê de bûm , dosteke min li milê min dida û digot : Diya Şêrzad, serê xwe rake negirî, xwîşka delal, va ye hevalên wî hatine . Min dizanî ku, giyanê Şêro, li rex min bû… Wisan jî, bawer bikin min ew dît, gotin û şîretên wî , mîna zengilan xwe li guhên min didin û hê jî ew zengil deng vedidin !!! ?

# Mamoste Mistefa Tatoz
# Jiyana xwe ji dest da

Li roja Şemiyê. 21-04-2624k-2012z mamoste M. Tatoz li bajarê Heleb, di nexweşxana Firansî-Sûrî de ,jiyana xwe ji dest da û çû dilovaniya Xwedê . Li roja dî, bi beşdariya gelek meriv, dost û berketiyên wî, cenaza gorbihuşt berve bajarê Efrînê hate birêxistin. Di dûre , di mal de hate şuştin û li goristana Zareta Henên hate veşartin.Riwêresa veşartinê bi telqînê dest pê bû, di dûre dostekî wî M. Şêx Osman gotinek devkî pêşkêşî beşdaran kir, Paşê gotina Partiya Yekîtî ya Demokrat a Kurd li ser hate xwendin û li dawiyê , birayê wî Cemîl sipasiya beşdaran kir.



Bi navê komîta rêvebiriya weşana Newrozê , em serê xwe , xwedî û dostên wî sax dikin û ji Xweda lava dikin, ku di bihuşta xwe de cîwar bike.

Deqê gotina YEKÎTî ev e:

**Beşdarên rêzdar û bi rûmet , silav û rêz…!**

Îro roj, roja yekşemê , 22.4.2624k – 2012z ye ,roja koçbarkirina welatperwerê Kurd ê bi nav û deng Mistefa Tatoz e.kek Mistefa….! Vaye meriv , dost û hemî berketiyên te, bi dilekî xemgîn û çavên ziwa ji dûr û nêzîk hatine ser goristana zareta Henên – li rex nemirê kurd Dr.Nûrî Dêrsimî , ta ku , canê te yê paqij binax bikin , silava dawiyê li te bikin û xatirê xwe ji te bixwazin.

**Xwîşk û birayên hêja….!**

Mirin her mirine, lê , xwezî li cane mirovê ku tevdîra xwe ji vê royê re kiribe,û kar û xebateke baş û bi kêrhatî ji bo gelê xwe –berî mirinê- li şûn xwe hîştibe. Gorbihuştê me Mistefa yek ji wan kesên , ku jiyana wî ne rij û tisî ye. Ew li sala 1950 î ji dayik dibe , li sala 1970 ê derbasî nav refên tevgera kurd li Sûriyê –El Partî- dibe, li sala 1974 an, di nav xwendekaran de, dibe endamê şaxê ,û weha dimîne ta ku , li sala 1977an –ji bo kar- dere Almaniya .Ji bîr nebe, ku kek Mistefa fêrnama macistêriyê di aboriyê de, li zanîngeha Helebê werdigre. Herweha çend salan li Almaniya kar dike û paşê ji nû ve vedigere cîwarê bav û kalên xwe û di zanîngeha Heleb de,kardike, Ta ku , li 21.4.2012 an bi nexwaşiya dil, di nexwaşxana Firansî-Sûrî de, çavan vedimirîne û dere dilovaniya xwedê. Hêjaye bê gotin , ku mamoste Mistefa (bavê mesûd) jiyana xwe ya ne partî jî, weke welatparêzekî , ku nêzîk tevgera xwe ya Kurd derbas kir.Herweha wî ji zimanê kurdî jî gelekî hez dikir, ne tenê hezkirin û hew, lê bi kartanî jî. Bi taybetî nivîsandina gotaran û wergerandina berheman ji Almanî ta kurdî .

Li dawiyê em bi nave P.Y.D.Ks serê xwe , xwedî û hemî dost û berketiyên kek Mistefa sax dikin; sebir û aramiyekê ji wan re hêvî dikin, û buhuşta bilind û rengîn ji kek Mistefa û hemî şehîdên azadî û rûmetê ,û bi taybetî yên Kurd re lava dikin. Careke dî xwedê sebrekê bi xwediyan de , tu êşek û te'iliyan negîne we , û sipas ji cefayê we tevan re. **P.Y.D.Ks**

********************************

**Dumahîk: İsmaîl Beşikcî**

YEyê de, Konferansa İslamê de, di Yekîtîya ‘Ereban de, di Teşkîlata Hevkarî û Ewleyiya Ewropayê de, di Rêxistina Yekîtîya ‘Erîqa de… dewletên ku serjimara wan li dora 30-40 hezarî ne jî hene. Li hember van rewşan divê Kurd pêwendiyên navnetewî bidin ber lêpirsînan. Divê pêvajoya ku Kurdan bê statû hiştiye û sedemên ku Kurdên, xwedî serjimareke ji çil milyonan zêdetir, bê statû ne bêne lêpirsîn. Divê çapemeniya Rojava, Universiteyên Rojava, saziyên sivilên civakî jî vê lêpirsînê bikin.

Wergera ji bo kurmancî: **Ahmed KANÎ**

# Bawer Mekin Ew Mir?

**Enahîte Morad**

Piştî ew xişm û bêtara ku ji nişke ve bi ser me de hatî , kurê min yê nazdar û delalê dilê min Şêrzad bi destên qirêj – gemar û bi xinzî dihate kuştin ! Wa hîngê pî û basik li min şikestin , jiyan di çavên min de bi çûk û vala dibû , mîna laşakî bê giyan dimam ! Tenê hebûn û sekinandina dost , hogir û hevalên partiya wî nemaze hevalên xwendekar ên xoşewîst û hêja hêz didane min ku , li ser lingên xwe bisekinim û pêşewaziya mêvanên şêrê xwe bikim . Lê ez ji agirê dilê xwe re çi bêjim, bi şev û roj tebat û hêmenî nediket dilê min, xem û êşên demê tev li min civya bûn! Di navbera pêlên xewin û rastiyê de winda dibûm , tu carî nikarim koçbarkirina bijîşkê xwe bipejirînim ,lewrejî her şev li hundirên malê qunc bi qunc min dipeland ! ji pênûs , pirtûk , cilên wî dipirsîm ?.
Min bi dengê bilind ,banga xwe, li wî dikir û digot : Şêrê min qurbana te bim, çima nivîn û yataqa te vala ye, wey xalî li serê min ,ku tu bi hêsanî ji min dizyane, hîngê har û dîn dibûm , min hêvî û tika dikir ku, ev serpêhatiya derew û xewin be !
Vêca jî, ta çilrojiyê rewş û halê min ev bû, rojekê bavê Sêro, ji min re digot : Diya Şêrzad, vaye çelroj e, di ser wa bûyera bêbexet û nemirovane re dibore, Pêwîste em biçin gund û çelê kurê xwe li dar xin . Wisan jî, me berê xwe dida gundê Elemdara û amedekar li benda heval û hogirên wî yên xoşewîst diman , lê hê jî min bawer nedikir ku Şêrzadê min koçbarkirî, ango herdem pêjin û xeyala wî li pêş çavên min diçû û dihat, jiyana bîranînên wî hêz didane min,ku bi hêviyên zor bilind, li benda mêvanên Şêrê xwe dimam ?.
Roj şemî -23-Avdarê -2012 ê zayînê,li kat yek nîvroj, dema dengên hevalên wî li guhên min diketin, hingê min temaşe dikir, ku ez çi bibînim hevalên bijîşkê min mîna refên kevokan , li dirêjahiya rêka gundê Elemdara, bi cilên rengîn, digel hildana simbola partiya YEKÎTÎ û ala Kurdistanê ya giranbiha, bi yek dengî dirûşmên xwe hildidan û weha digotin : Bavê Şêrzad serbilind be , diya Şêrzad em tev Şêrzad in, Şehîd namire, her û herbijî Şêrzad û H.W.D . Di nav dengên wan de, dengekî pir xweş û zîz xwe, bi dirûşmên balkêş hildida û digot : Her bijî Kurd û Kurdistan, bijî azadî.
Wa hingê, şêtmayî dimam û di ber xwe de dipeyvîm û min digot : Bi Xwedê, ez ne şaşim,ew çêrok tev derew e ,ev dengê xweş yê Şêrzad e, yê çavreşê min e, vaye ew li rex hevalên xwe ye … Her ku ew nêzîk dibûn, Şêrzad bi rûkî li ken berve min dihat û digot : Yadê delala min, vaye ez hatim, çima digirî qurbana te me negirî, ma tu dizanî ku hêstirên te birînên min gur dikin ?!. Tenê kenê te, birînên min dikewînin, yadê agir bi mala dijimin û neyaran keve ku, destên me ji hevdû kirin .
Min mîna kesên sermest, Şêroyê xwe hembêz dikir, bi ken û girî tevlihev jê re digot : Qurbana te me şêro, vaye bêtirî çel rojî ye ,pirsa te dikim lê, tevan derew li min dikirin û digotin, ku Şêro koç barkirî û ew bûye bîranîn !.Lê min ji wan bawer nedikir û herdem li benda hatina te dimam kurê min, bi Xwedê min dizanîbû ku îro tuyê ligel hevalên xwe bî!. Bi rûkî berkenî, bijîşkê min, bersiva min dida û digot : Yadê qurbana te me, dilê xwe rihet bike, ma tu nizanî mirin jiyaneke nû ye.. Ez di nava refên nemir û pakirewanên gelê Kurd de cîhekî bilind û bêlikirî digirim ,yên mîna Qadî Mihemed **D.R.( 3 )**

# Banga Piştgtiriyê

***Derdora 260 rewşenbîr, siyasetvan û çalakvanên Kurdan ev bang bi zimanê Kurdî û Tirkî imze kirin û ji raya giştî re weşandin. Eve deqa wê ye:***

**Banga Piştgirîya ji bo Gelê Kurdistana Sûriyê:**

**Serkevtina Me bi Yekirina Hêz û Rêza Me Dibe!**

Ev meseleyên ku îro di cografya Ereban û Rojhilata Navîn de peyda bûne, destpêka wan dighêje hinek rêze peymanên aşkere-veşartî yên dema dawî ya Şerê Cîhanê yê Yekem, ku hêzên hevpeyman serkevtiyê wî bûn. Di sala 1920an de, du hêzên emperyal ên wê demê digel du dewletên kevnare yên Rojhelata Navîn, bi hevkariyê êrîş birin ser Kurdan û warê wan ê kevnare yê dîrokî. Kurdistan, bi van peymanan di navbera dewletên herêmî de(Iraq, Turkiye, Îran û Suriyê) hate parvekirin. Bi vî awayî, hemû mafên ku miletbûna Kurdan diyar dikin, ji wan hatin girtin. Ji ber vê yekê Kurd, di herêmê de wek milleteke bêdewelet a herî gewre, nêzîkê sed sala ne ku têkoşîna bidestxistina mafên xwe yên netewî didomîne.

Di demeke nêzîk de rijîma Beis a Iraqê têkçû û îro jî li hemberê dîktatorîya Beşar Esed û Beisa Sûrî, helwest û berxwedana Kurdan, dê ji bo hilweşandina balansa herêmî û statuqoya heyî bibe pêngaveke dîrokî. Lewre Sûrî di herêmê de xelekeke pir girîng a statuqoyê ye û perçebûna vê xelekê, dê bi xwe re gelek guhertinên nû jî derxîne holê. Ji ber vê yekê, divê em li ser mesela Suriyê û guhartinên di herêmê de helwest û tîfaqa Rusiya, Îran, Çîn û girûbên li dor û berê wan jî, di vê çarçovê de binirxînin.

Dewleta Sûriyê ya îroyîn, sala 1921an, bi Peymana Londrayê hate damezrandin. Ev peyman di navbera Firansa û hikumeta nû ya Turkiyê de hatibû imzekirin. Bi imzekirina vê peymanê, Kurdên Bakur û Kurdên Rojavayê Başûr bêrizamendiya xwe ji hev hatine veqetandin û di navbera wan de dîwarên bi sitrî hatin lêkirin. Bi vê awayî Kurdên Rojavayê Başûr ketin bin desthelatdariya Erebên Sûriyê, lêbelê tu demekî ji dawxaza mafên xwe yên rewa û dest ji berxwedan û têkoşînê bernedan. Sala 1927ê bi beşdarbûna gelek girûbên sîyasî yên cûda Partiya Xoybûnê hate damezirandin. Her çiqas bi tevî destpêkirina Şerê Cîhanê yê Duyem, têkoşîn û xebata Xoybûnê dikeve pêvajoyek lawaz û pêre bêdengiyek peyda bibe jî, di dawîya salên 1950î de, têkoşîna Kurdan li Sûriyê dikeve pêvajoyeke nû. Partiya Demokrat a Kurd li Suriyê tête damezirandin û Nûreddîn ZAZA dibe serokê wê. Partiyê di bin zixt û zordariya desthilatdariyê de heta Tebexa sala 1960î, bi awayeke aktîf xebata xwe berdewam kir. Ji sala 1961ê şûn ve ,li pey hev darbeyên leşkerî pêk hatin û di encam de, hemû mafên komelî yên Kurdan ji dest wan hatin girtin.

Sala 1963an Partiya Beis bi darbeyeke leşkerî desthilatdarî bidest xist. Piştî ku desthilatdarî kete destê Beisîyan, rijîmeke otorîter û zordar hate damezirandin. Li gor bernameya Partiya Beisê, *"her kesê li Sûryê dijî Ereb e û zimanê wan jî erebî ye."* Piştî vê pêvajoyê dijraberê Kurdên li Sûriyê, şovenîzma erebî û nijadperestiya Beisiyan bêtir bû.

Bi tevî ku nifûsa Kurdên li Suiryê ji nifûsa gelek îmaretên erebî û Erebên Filestinî yên ku di rojeva dunyê de ne, zêdetir e jî, li gorî pîlan û armanca ku bi navê "***Kembera Erebî***" tête naskirin, pêvajoya polîtîkayeke tûndrew a erebkirinê dest pê kiriye û rijîma Beisê sîyaseta xwe ya *erebkirinê* heta îro domandiye. **D.R.( 7 )**

**Dumahîk : Pişgiriya …**

Piştî serhildana sala 1982 an ya Humus-Hema û serhildana sala 2004an a Qamişloyê, desthilatdariya Beis û rijîma Esed hetanî îro bi serhildanek girseyî ya bi vî rengî re rûbirû nebûye. Di vê rewşa hanê de, nemimkune ku rijîm hebûna xwe berdewam bike. Bi tevî vê yekê, derûdorên ku di bin kevalê(postê) çepgiriya azadîxwaz, demokrasî û mafên mirovan de, beriya nûka piştgiriya Sadamê dîktator dikirin, îro jî li Antaqyayê xwepêşandanên ji bo piştgiriya Beşar Esed dikin. Bêguman nemimkune ku tevger û hewldanên wisa, pêşiyê ji nû ve li pêş herikîna dîrokê bigrin. Ji ber kîjan sedeman dibe bila bibe, bi aşkere yan veşartî, ew ên ku piştgiriya rijîma Beisê bikin, wê bibin şirîgê sûc û kiryarên Beşar Esed.


Li vê derê mijareka girîng a ku divê bête diyarkirin û bibîranîn, helwesta opozîsyona Erebên Sûriyê ye. Ji aliyê girûbên opozîsyona Suriyê ve, Heta vê gavê derbarê çawaniyetiya Sûriyê piştî têkçûna Beşar , daxuyanî û bernameyeke sîyasî ya zelal nehatiye dîyarkirin. Divê girûbên Opozîsyona erebî ya Sûriyê, ji bo pêvajoya piştî têkçûna rejîma Esed, bi awayekî aşkere sîyaseta xwe ya derbarê Kurdên li Sûriyê dîyar bike.

Îro ev tevgera gelêrî ya ku bi navê “Bihara Erebî” tête binavkirin, divê tenê wek hilweşandina rijîmên dîktator ên erebî neyête dîtin, herweha divê awayê çareseriya hemû meseleyên netewî, etnîkî û dînî yên vê cografyayê jî têkevin rojevê û bêne nirixandin. Gerek bête zanîn ku taybetiya herî girîng a sedsala 21ê jî ev e, ku meseleyên çaresernebûyî yên neteweyî, etnîkî û dînî cardin bûne yekemîn mijara rojevê. Di vê çarçoveyê de ,daxwazên netewî yên Kurdan, bi kêmtirîn qasê daxwazên gelê Filestînî, Sûdana Başûr û Kosowayê rewa û girîng in.

Ji bona vê yekê, em “***mafên çarenûsiyê***” ji biryara Encûmena Niştimanî ya Kurd li Sûriyê dikin, ku ev Encûmen roja 27/10/2011 di encama berhevbûna Kongreya Niştimanî ya Kurd Li Sûriyê hatibû hilbijartin. Hêviya me ev e, ku li ser heman zemînê Meclîsa Niştimanî ya Kurd li Sûriyê, bi beşdarbûna girûb û unsûrên din jî bihêztir û serkevtîtir be. Divê em bi bîr bînin, ku kîjan girûb dibe bila bibe, kîjan sedem tê nîşandan bila bê nîşandan, ew helwest û hewldana ku ji bo yekîtiyê xizmet neke wê di nav pêvajoya dîrokê bête mehkumkirin.

Di dawiyê de, ev nêzîkê pêncî û pênc sal in ku gelê Rojavayê Başûrê Kurdistan û Erebên Sûrî, ji aliyê rijîma Beis û malbata Esedê dîktator ve, bi awayek hovane têne perçiqandin, kuştin û zordariyek dijwar li ser wan tête kirin. Em ev hovîtiya Beşar Esed û rijîma wî û hevalbendên wî bi tûndrewî şermezar dikin…

# Ji weşanên Kurdî yên nû








1-Pirtûka "Rêzimanê Kurdî" ya helbestvanê Kurd ê navdar Seydayê Mele Ehmedê Palo. Pirtûk ji 180 rûpelên mezin pêkhatî ye. Pirtûk hêjaye ku di pirtûkaxaneya zimênê de cih bigre û bê xwendin û lêkolînên zanistî li ser bêne çêkirin.

2-Pirtûka "Ramanek" ya nivîskar Lewendê Dalînî(Sêf Dawid) derket. Pirtûk ji 105 rûpelên piçûk û 13 kurte çîrokan pêkhatî ye. Hêja ye ku ev pirtûk a bi zimanê Kurdî bê xwendin û bi zanistî bête nirxandin

# Parastina Zaravayên Kurdî

Riza Çolpan ê Dêrsimî

Ji hemû xwendevanên kovara Pirsê û Rojnameya Newroz ê re "Roj baş, dema we xweş birayên xoşewîst" dibêjim û destpêka nivîsa xwe dikim.



Adar e, Bi Êş û Jan
Him Cejn e, Him
Dîlan e
Dema we bi xêr, roj baş xwendevanên hêja. Gelek wext e ku min jî dev ji nivîsîna zimanê xwe yê zikmakî berdabû. Hecku min dixwast herdem qasî zanîna xwe,ez bi zimanê dayîka xwe hin tiştan binivîsînim, lê sed mixab û sed heyf e ku xwendevanên zimanê dayîkê gelek kêm in. Ji ber vê yekê jî mirov carna bêgav dimîne û zimanê ku dijminê xwînxwar bidara zorê ji gelê me yê kesîb daye fêrkirin, wî zimanî dinivîsîne.

Ji bo vê jî daxwazî û mabest dîyar e, ez bawer im her kes dizane. Ango gelê me bi zimanê xwe yê zikmakî ve nehatîye perwerdekirin. Nêzî sed sal e ku zimanê dayîka me hatiye qedexekirin, gelê me bi zimanê dijminekî zalim ve tê perwerdekirin û tê xapandin. Ji ber vê yekê jî hemû nivîskarên Kurd, -Kurdên bakurê Kurdistan- bi piranî bêgav dimînin û bi zimanê dijmin dinivîsînin, dixwazin bi vî zimanî peyamên xwe bigîhîjînin gelê xwe. Di vê gelşê de nivîskarên bakûrê Kurdistan çiqas bi heq in, ez wê jî ji we xwendevanan re dihêlim. Herwaha xwendevanên xoşewîst, ez vê gelşê dirêj nekim, werim ser gelşa binyat, ango asas. Ji ber ku li jor sernivîs bi navê meha Adarê destpêbûye. Min gotiye "Adar e, bi êş û jan e, him cejn e, him dîlan e". Bi rastî jî wisa ye ,ne wisa?.

Gelo meha Adarê çira ji me Kurdan re him bi êş û jan e, him jî cenj û dîlan e? Niha bi destûra we ez dixwazim werim ser pirsa vê gelşê û mijarê.

Çawa ku hûn jî dizanin, bav û kalên me ji me re: "Meha Adarê, mizgîna destpêka biharê ye gotine. Li ser deşt û çiyan, kaş, tap û zinarên Kurdistan barana berfê kêm dibe. Dar û ber hêdî-hêdî di bin berfa sar û qemir de derdikevin, di gelek ciyan de, dar bişku didin, şilî û şepelî berfê dihelîne, xweza tê guhartin. Hin kal û pîrên gundê me, di heft, neh, hivdeh û bîst û yekê vê mehê de rojî digirtin. "Rojî digirtin" dibêjim, lê şêşt sal berê, niha nizanim. Ji ber ku diya min a dilovan hersal, di van herçar rojan de rojî digirt, lê ji bo çi bû nizanim". Diya min digot "Va her çar rojana ,rojên pîroz in", lê pîrozbûna van rojan li ku dihat min jê pirs nekir. Ji ber ku ez zarok bûm, pirskirin nedihat hişê min, heya roja mirina wê jî min jê pirs nekir. Tiştê ku tê bîra min, hemû kal û pîran bi taybetî ji bo roja bîst û yekê Adarê "Îro roja nû ye, sersal e, ji me re wek cejn e. Ji ber ku di vê rojê de sêla sor, ango sêla germ dikeve binê erdê, erdê germ dike, ax berfê dimêje, bi hemû nebatên xweza ve avis dibe. Heman wek dayîkek çito ku di zarok de ducan dibe" digotin. Bi rastî jî wisa ye. Li Kurdistanê -dîsa bi taybetî jî, ez ji bo Kurdistana Bakûr dibêjim- di vê mehê de rewş bi tevahî tê guhartin. Mî, bizin, çêlek dizên, kalandina berx û karikan, mûr e mûra golikan ji gel re dibe awaz û melodiyek xweş. Dew, mast û rûn zêde dibin. Cotkar, nîr, hevcar û gîsinên xwe jibo cotê Biharê amade dikin, kebaniyên malan"Buhar e, Adar e, dew li dar e dibêjin, hewa ne pir germ, ne pir sar e, li bin çêlekê golik, li bin miyê berx, li bin **D.R ( 11)**

# Sazûmana Sûriyê sazûmanekî awarte û cudawaz e

**Rozad Elî**

Partiya Be'is (PB) li sala 1963an textê destlatdariya Sûriyê bi darê zorê wergirt. Dîroka wê li ser destaltê mêlag dike, ku ew di her quncekî dîroka xwe de cudawaz e, û di şêweya wêrankirina her warekî dewletê û civakê de jî dîsa bê mînak û awarte ye.

PB li 8 î Adara sala 1963an ,bi rêka inqîlabeke leşkerî destlat wergirt, ango bê hilbijartin, û bi şêweyekî ne rewa,awarte û bê vîna gelê Sûrî destlat stand.

Pişt re, li sala 1966an hinekan ji rêbertiya PB inqîlabeke li hevalên xwe kirin, û rêbertiyeke nû dîsa bi rêyeke ne destûrî û ne rewa li ser textê dewletê danîn. Rola serokê Sûriyê yê berê Hafiz Esed di wê inqlîbadê de sereke bû û postê wezareta berevaniyê wergirt. Û piştî wê bi salekê, di şerê Hezêrana 1967an de, di navbera Ereban û Îsraîlê de, bê ku artêşa Sûrî şerekî berçav bike, ji navça Colanê kişî û radestî Îsraîlê kir. Lê belê, li şûna ku wezîrê berevaniyê Hafiz Esed were darizandin yan jî ji ber xwe ve ji ser postê wezaretiyê dagere, ew li ser wezîfa xwe ma, û li sala 1970yî inqîlabeke din rakir û vê carê destê xwe danî ser postê serokmariyê bixwe.

Ji wê salê ve ,şopeke nû li ser bingeha ramana PB hat vekirin, û rêbazeke siyasî û civakî ye cudawaz bi navê (rêberê bav) Hafiz Esed hat ajotin, navnîşana wê bi tevahî, tunekirina îrada gelê Sûriyê bû.

Hafiz Esed ji ba Kurdan de, dest bi cihanîna rêbaza xwe kir. Wî li sala 1973an pirojeya Kembera Erebî ya nijadperest li herêma Cezîrê bicih anî, û piraniya endamên komîta navendî ya Partî Demoqratî Kurd li Sûriyê jî girtin û avêtin zîndanê.

Di warê jiyana siyasî de, û ji ber ku li wê demê Partiya Komonîst û hêzên Nasirî hêzdar û xwedî cemawer bûn, destlatê ji wan de dest pê kir, û ji bo ku wan berhemêz û paşê jî perçe û bêhêz bike, PB ji wan re de'fa Bereya Niştimanî ya Pêşverû" vena, ew hemî xistin bin rêbertiya xwe, û herwiha di navbera çend salan de, ew partî hemî perçe û lawaz kirin, û PB bû partiya destlatdar û rêber a tek û bi tenê û bê rikber û hemî warên siysetê, dewletê û civakê jî xistin bin kontrola xwe ya destgiran.

Sazûmana Hafiz Esed li sala 1973an, li gel Misirê kete şerê Tişrînê, lê di encamê de navça Colanê venegerand û ra niha jî wisa ye.

Li sala 1976an destlatê û dezgeha serokatiya Hafiz Esed, artêşa Sûriyê derbas Libnanê kirin, û di encama wê destdirêjiyê de ,bi hezaran hemwelatiyên Libnanî û leşkerên Sûrî hatin kuştin, û Libnan bi xwe jî ji hêla rêberên artêşa Sûrî û dezgehên wê yên asayişê ve wek welatekî dagîrkirî bikar hat, sermiyana wê mêtin û ji her aliyekî ve wêran kirin.

Ji sala 1977an ve û ra sala 1982an, bi behaneya rêbirînê li ber çalakiyên çekdar yên rêxistina "Ixwan Mislimîn", hêzên leşkerî û dezgehên ewlekariyê, kiryarên zor çepel û cudawaz li gelek gund û bajarên Sûriyê kirin, û ew kiryarên çepel bi komkujî bajarê Hemayê bi dawî kirin.

Piştî bûyerên Hemayê û ra roja mirina wî, Hafiz Esed hemî partiyên siyasî yên xwedî bîr û bawerî yekcar pişaftin û jiyana siyasî li Sûriyê ji her aliyekî ve wêran kir.

Bitevahî, di dema destlatdariya Hafiz Esed de, guh, çav û devê mirovê Sûrî hatin bêkarkirin, û civata Sûrî jî bû dareke hişk, bê ber, bê giyan, bê aso û bê hêvî. Ji aliyê dezgeh, sazî û îdareyên dewletê ve jî, gendelî, bertîl, rotîn û her tiştê ku ziyanê digihîne jiyana rojane ya mirovê Sûrî û wî li şûn dihêle, gihîştin radeyên pir ziyanbar û bilind.

Di vê rewşê de, saziyên ewlehiyê pir bûn, mezin bûn, bûn destlatên rastînkî di her war û mofirkeke dewletê de, wan **D.R.(10 )**

**Dumahîk** : **Sazûmana**….

tevahiya civakê dorpêç kirin, û ra hûrmûrên biçûk ên jiyana rojane ya welatiyên Sûrî kirin bin çavdêriya xwe ya sert. Ango ew dezgeh li ser sîngê tevahiya Sûriyan bûn zinar û barê giran, û paşeroj û aso reştarî kirin.

Li sala 2000an dema ku Hafiz Esed çû diyarê heq, kurê wî Beşar jî mîna bavê xwe, bi şêweyekî awarte, cudawaz û ne rewa hat ser postê serokatiya Sûriyê.

Lê belê, serokê nû Beşar Esed posta serokatiyê bi destê hinek ji wî xortir wergirti bû, loma jî wan hinekan, wekî mafekî wan î rewa, hemû karûbarên dewletê xistin bin fermana xwe, û berhem û arzûyên dewletê yên ku hîn mabûn, dotin, û bi riya dezgehên asayîşê, dewletine veşartî yên dizekan di hundur dewletê de ava kirin.

Di hêla siyasî û rêvebirina dewletê de jî, rêbaz û rêça Hafiz Esed di hemî warên dewletê de wek xwe ma, û şêwe û alavên berê yên ne demoqrat û ne rewajî mîna berê bikar anîn.

Di vê karnavê de, ango di berdewamiya serdariya giştî ya yek partî û yek rêber de, û ji bo ku dezgeha destlatar ya nû serdariya xwe biparêze û berjewendiyên xwe jî ji dest nede, wê hemî bang û daxwazên gelê Sûriyê ji bo dadmendî, wekhevî û azadiyê ku ji salan ve têne kirin, pişguh dikirin û bi darê zorê diperçiqandin.

Ev dîroka reş ya PB û destlata wî ya tekepartî û istîbdadî ku li dirêjiya nîv çerxî didome, dewleta Sûrî daxist pileyeke şaristanî ya pir nizim, û civaka wê jî gihand deraqekî pir qeyranbar û pengijî. Û dema ku li Bihara sala 2011an gelê Suriyê doza mafê xwe yê rewa ji bo azadî û rûmetê kir û serê xwe bi riya xwepêşandanên aştiyane hilda, sazûmana PB ku daketiya radeya diktoriyeta siyasî, bi şêweyên xwe yên cudawaz û pir bi awarte bersiv da, û tevahiya xaka Sûriyê bi gelê xwe re kir eniya şerekî qirêj.

Belê.. Sazûmana PB li Sûriyê ji roja binerojê de sazûmanekî cudawaz û awarte ye, ji ber ku ew bi şêweyekî cudawaz hatiye, bi awarteyî destlatdariyê dike, bi awarteyî dixwaze bimîne û pir bi cudawazî û bi bêmînakî jî bersiva banga gelê xwe dide.. Loma jî, tê bawerkirin, ku eger ne bi şêweyekî cudawaz û awarte be, ev komika ku li ser destlatê har û hov bûye, yaqeya gel û welêt bernade û ji ser serê dewletê danetê.

*******************************

## Çilrojiya hevala Caziye

Bi boneya derbasbûna çilrojiya koçbarkirina hevala me Çaziya Mihemed Fehîm û Cejna û Cijna Jinên Cîhanê, li Qamişlo roja 8ê Avdarê, rêxistina jinê ya partiya me ( P.Y.D.K.S)civatek li dar xist. Bi rawestandina demeke bêdeng li ser giyanê hevala Caziya û hemî pakrewanên şoreşa azadiyê li Sûriyê,civatê dest pêkir. Piştre ,birek gotin û helbest hatin xwendin, jimarek ji wan destnivîsên havala Caziyê bi xwe bûn. Herweha gotina rêxistina Qamişlo ya partiyê û gotina malbata remetiyê jî hate xwendin. Piştî wê , hevalekê tabloyên ku hevala Caziye amedekiribûn ji beşdaran re şirove kir. Di dawiyê de, gotareke pênasînê bi roja Çîhanî ya jinê hate xwendin û ev jî deqa wê ye:

Beşdarên birêz hûn bi xêr hatin…

Îro, ji bo em hevala xwe ya hêja, xebatkar, bêrewer û xwediyê dozê, ew doza ku em hemî di ber de xebatê dikin, di bîra xwe de bînin, em li vir civiyane. Me xwest ev civata me li mala hevala me be, ji ber ku me gelek civatên rêxistinî, rêxistinî û xelekên fêrbûna zimanê Kurdî li vir dikirin.Diya Kawa , weke çawa meteloka kurmancî gotiye : " Şêr şêr e, çi jin çi mêr e"bi kar tanî, bê westan wê karê xwe di nav heval û dostan de dikir û lomajî bibû cîgehê rêz û rûmetê.

Rîzdarê bi rûmet:




Xwîşk û hevala me di mala xebatkarê hêja Bavê Azad de perwerde bûye, ji be wê jî , ev heval ji çûkaniya xwe ve bûye xwena hestekî netewî û niştimanî.

Hevala Caziye tê tim li bîra me bî,û emê ji zarok û neviyên xwe re bibêjin hevala me xebatkareke hêja bû, azadî û wekhevî daxwazên wê , pêkanîna aştî û morovatiyê ji armancên wê bûn. Em bawerin dê armancên te bi cih werin, gelê te yê Kurd mafên xwe di welatekî azad de wergire û bibe xwediyê rûmet û payeke giran.

Rêxistana jinê ya (P.Y.D.K.S) li Qamişlo

**Dumahîk : Parastina…**

bizinê kar e”. Dibêjin, bi meşkan dew dikên,û şap-şapa meşkan dibe melodî û awaz ji bo gundiyan. Teyr û tûr jî di qul û şikeftan de derdikevin, ew jî li hewa difirin, bi buharê şadibin, ji xwe re hêlînên nû çêdikin, têda hêkan dikin, kurk dibin çêlikan tînin der, û ew jî wek me mirovan û hemû jîndaran bi çêlikên xwe şa dibin. Gelo rewşa îro li Kurdistana bakûr wek van gotinên min e?. Ez bawer nakim. Gotinê min ên li jor, ji bo şêşt sal berê ne xwendevanên hêja. Sî (30) sal e, ku di wî welatî me de şerekî bi xwîn heye, sed hezar (100.000) kesên me hatine kuştin, çar hezar gund hatine hilweşandinû şewitandin, bi mîlyonan Kurd koçeber bûne ,ketine nêzî metropolên dijmin; tazî û birçî, bê kar, bê war û bê mal mane. Di pagê malê gundiyên Kurd de, kund dixwînin, mişk û maran hêlîn çêkirine, beraz tijî bûne. Gundên ku mane jî, niha di wan gundan de, ne meşk maneû ne sêpê, ne ga û gam, ne bêder, ne nîr, ne jî hevcar û gîsin. Di dewsa van de patoz û traktor hene. Meşk, lolewî, kêrî, sêpê, nîr, hevcar, tapan û gîsin bûne hacetên kevin, ango kilasîk, antîka. Êêêêêêêê cîhan e, ken û kêf û dîlan e/ Derd, kul, keser, êş û jan e/ Mirov jî pitik e, xort e, ciwan e/ Roj tê kal û pîr e, bê teqat û mecal e. Ne wisa?. Belê, di zaroktiya min de, rewş wek gotinê min ên jor bû, lê bîst û yekê Adarê wekî cejn nedihat pîrozkirin. Erê ,navê gelek keçên me Newroz bû, lê cejn û dîlanî tunebû li herêma me, balam li hin ciyên din rewş çito bû, ez wê nizanim. Ji ber ku li piştî 14-4-1951’î de ez ji welêt derketim, bûm terkî-welat, li piştî sala 1979, cara yekem di vê kişwera kevin de -Awistûralya- ez bûm nasê cejna xwe ya Newroz û dîlaniya vê roja pîroz.

Heman wisa xwendevanên delal, ez serê we nêşînim, vêca jî werim ser êş û jana meha Adarê. Çira min got “Bi êş û jan e?.Bi rastî, piştî tevgera hesinker, mêrxwas û lehengê Kurd Kawa yê gorbihişt, di tevahiya dîroka gelê Kurd de, mehên Adarê çito û çawa derbas bûne, ez wê rind nizanim; lê, li destpêka sedsala bîstan heya roja îro, ez pir, hindik dizanim di meha Adarê de li welatê min çi bûye, çi bûyer qewimîne. Bê derew di sedsala bîstan de,
meha Adarê ji me Kurdan re bûye meha reş-girêdanê. Tevkujiya Dêrsim di bihara sala 1937’an, meha Adarê dest pê bûye û dijminê zalim li ser wî erdê evrar û pîroz, heftê hezarî zêtir (70.000) gelê me bi barbarî kuştiye,û ev meha ji me re kiriye meha reşgirêdanê. Li pey wê sal û rojan, dîsa gelek bûyer di vê mehê de cî girtine, gelek Kurdperwerên Kurdistanê hatine kuştin.

Dîsa di diwanzdehê (12) Adara 1971’î de bîrname ya faşîzmê û kuştina gelek kesan û dardakirina sê xwendevanên ciwan, ku ez bawer im ji wan dudu Kurd bûn, Huseyîn Înan û Denîz Gezmîş.

Li pey wê barbarîya Roma Reş, vêca jî di şanzdehê (16) Adara sala1988’an li başûrê Kurdistan, Sadamê zorba, zalim û faşîst, li ser Kurdên bajarê Helebce bombeyên kîmyewî bi karanî û barand. Di wê barbariya ne mirovî de, pênc hezar (5000) zar- zêç, kal, pîr, jin, bûk, keç û xortên me cangorî bûn, deh hezar(10.000) kes jî birîndar, seqet û kor bûn. Ji ber vê yekê ye, ku ez dibêjim“Adar e, bi êş û jan e/ Him cejn e, him dîlan e. Çira dîlan e, min li jor got. Niha jî bi destûra we ez li jêr ji we re helbesta xwe ya ku min ji bo tevkujiya Helebce di wê salê de nivîsîbû, binivîsînim. Berê ku ez destpêka nivisîna helbestê bikim, ez wek Kurdekî Kurdevîn, li pêş giyana hemû cangorîyên Kurdistan, bi rêz serê xwe xar dikim, ditewînim, ku heye “Ciyê wan bihuşt be, di nav şewqê de razin” dibêjim, wan bi dil û can jî bîrtînim.

hewldanênTirkiyeyê hemî li ser asteng kirina Kurdan bo bidestnexistina azadiyê ne.

***Kovara BÎR:*** *Dema ku em bala xwe bidin li ser rewşa giştî ya Rojhelatanavîn, guhartinên li herêmê û rewşa Îran, Surye û Kurdistana Suryeyê bînin ber çavê xwe, di demeke nêzîk de bi taybetî ji bo kurdên Suryê û bi giştî jî ji bo kurdên din, paşerojekî çawa li benda(pawiga) me ye?*

-:Li Rojhilata navîn, tekoşîna li hember dîktatorên 'Ereb, bi awayekî rûxandina dîktatoriyan, di dîroka Rojhilata Navîn de pêngaveke girîng e. Ez bawer im ev pêvajo hem li ser Kurdên Suryeyê û hem jî li ser hemû Kurdên ku li Rojhilata Navîn dijîn bandoreke girîng û pozîtîf bike. Li vir tiştê girîng ev e: Divê Kurd di pêwendiyên xwe yên bi Konseya Muxalefeta Netewî an bi rejîma Beşşar Esad re li ser berjewendiyên xwe î netewî rawestin û wek peyman bidin nivîsîn. Bêgûman hevdîtinên bi rejîma Beşşar Esad re, ne bo girêdana bi rejimê re, belkî bo bidestxistina berjewendiyên netewî divê bên kirin. Bêgûman divê bi daxuyaniyên devkî yên Konseya Muxalefeta Netewî û Rejîmê neyê bawerkirin. Bi vî awayî lezkirina Kurdan jî ne pêwist e.

Ev rewşa îroyîn çi qas bidome, bo Kurdan dê encamên baştir derxe holê.

***Kovara BÎR:*** *Muhalefeta(opozîsyona) Suryê di têkilîyên navnetewî de, êdî wek muhatabek meşrû tête dîtin. Lêbelê muhalefetê hetanî vê gavê di derbarê Suryeya piştî Beşar Esad de, bi taybetî jî li ser mesela netewî ya kurdên li Suryê, bernameyeke siyasî ya aşkere dîyar nekirîye yan jî bernameyekê wan ê wisa nîne. Li gor dîtina we, divê çarçoveya têkilîyên aliyê kurd û opazîsyona ereb çi be û li ser kîjan esasan be?*

-: Ji hêzên girîngên ku piştevaniya Muxalefeta 'Ereb a Suriyeyê dikin belkî hêza sereke Tirkiye ye. Tirkiye ji bo ku Kurd tu sûd ji vê guherînê nebînin piştevaniya Muxalefeta 'Ereb dike. Polîtîkaya bingehîn ya Tirkiyeyê ew e ku bibe asteng li hember statu bidestxistina Kurdan. Civînên Muxalefeta 'Ereb yên li Antalya û Stenbolê astengkirina Kurdan bo vî awayî girîng hatiye dîtin. Muxalefeta 'Ereb, jiber piştevaniya Tirkiyeyê piştî Beşşar Esad di derbarê Kurdan de polîtîkayek nikare diyar bike. Lê, diyar bûye ku bê Kurdan jî gihaştina encamek nepêkan e. Jiber vî awayî KNS, hinek sozan dide Kurdan....

***Kovara BÎR:*** *Di derbarê vî mijarê(babetê) de gotina we ya dawî çi ye?*

-: Kurd, di Rojhilata Navîn de, ji çil milyonî zêdetir in. Lê, di pêwendiyên navnetewî de xwedî statuyeke siyasiya bi rûmet nînin. Bes navê Kurdan dema behsa "terorê" bê kirin derbas dibe. Koma navnetewî, bo bêstatûbûna Kurdan neguhere, bi vî awayî bidome, di nava hewldanên mezin de ne. Ev tê wateya ku di salên1920an de, di serdema Koma Miletan de tûrê bilanet li serê Kurdan hatiye daxistin. Rêveberiya Herêmiya Kurdîstana Başûr divê cihê bê nirxandin.

Di dunyayê de, îro, 208 dewlet hene. Ji van dewletan çil jê serjimara wan, nagihîje milyonekî. Di saziyên wek NY de, di Konseya Ewropayê de, di **D.R.( 4 )**

**Azadî ji girtiyên siyasî û xebatkarên gelê me yê Kurd re , yên di girtîgehên Sûriyê de**